

Spas ji bo zarok û dê û bavê beşdarkirî!



Koma Xebatê ya Bêşiklîya Derdora Ser, Navenda Netewîya Lênerîna Zarokan
Faktaansvarig: Utvecklingsenhet barnhälsa
Reviderat: 2024-11-01

TO PÊŞÎLÊGIRTINA RASTBÛN AN BÊŞIKLÎYA SERÎ

En Belavoka agahîyan ji bo dê û bav bi zarokên biçûk



Pêşniyarên pêşilêgirtinê

Zarokê we hêdî hêdî hîn dibe, çawa hemû bedena xwe kontrol bike. Eger zarokê hişar li ser zikî li ser erdê danê, masûlkeyên ku zarokê ji bo tevger û hevsengiyê pêwîst in tê xurtir bibin. Bi wî awayî tê zextên li ser serê zarrok rabin. Eger demeke dirêj piştê serê zarrok bikeve ber fişarê, pişka bin zextê tê hêdî hêdî rast bibe. Pê pêkanîna babetên hêsan ê jêr hûn dikarin pêşî ji rastbûna piştê serê zarokî bigirin:

Şûna ser zarrokê razayî berdewam biguherrîne, Rûyê wî/wê carna bizivîrîne alîyê rastê û çepê. Zarokan pê dengî, yan nîşandana pêlîstok û rên din jî teşwîq bikin ku serê xwe ji alîyêb cuda bizivîrîne. Eger tu goman dike ku zaroka te serê xwe di herdu alîyan re nazivîrîne an zêdetir ji yek alî dizivîrîne, divê bi hemşîreya/ê dermangeha zarokên bişêwirin.



Dema ku zarok hişyar e û hûn cem wî/wê ne, wî/wê danê ser zikî. Ji destpêkê ve, zarok rojê çend caran bi demjurtî, bo nimûne di dema paqijkirin û guhertina cilî, li ser zik deyne. Gengaze kêfa zarok li razana ser singê an çokên mezinan bê.



Dema ku zarok li ser zikê xwe li ser erdê dirazê, dikarin



bin zikê zarok betaniyeke badayî daynên. Bi vî awayî, zarok bi hêsanî dikare serê xwe bigire û destên xwe bi kar bîne. Her bi qasî ku rahênana zarok di rewşa razana ser zik da zêdetir be, zarok tê bi kêfa xwe demeke dirêj di vê mode ye bimîne.

Zarokê xwe bi caran û bi awayên cuda himbêz bike. Zarok gelek caran dixwazin ku cem dê û bavê xwe bin. Hetmen zarokê xwe bi berdewamî ji alîyê rast û çepê hilgire. Herwisa dikarin zarokên xwe ser zikî daynêne ser milê xwe..